# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (255) | Çirya Pêşîn / 15-10-2023


# ENKS red dike navçeyên Kurdistana Sûriyê bibin meydana nakokiyên di navbera PKK û Tirkiyê de




Kurdistan

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê armanckirina navçeyên Kurdistana Sûriyê ji aliyê Tirkiyê ve şermezar dike û bang li Tirkiyê dike ku van operasyonan rawestîne, herwiha daxwaz ji PKKê dike ku destêwerdanê di karûbarên Kurdistana Sûriyê de neke û wê ji metirsiyan dûr bixe. Sekreteriya Giştî ya ENKSê duhî di daxuyaniyekê de belav kir, "Ji 5ê Cotmeha 2023an ve, hêzên Tirkiyê gelek navçe li Kurdistana Sûriyê bombebaran kirine ku di encamê de ziyaneke mezin gihandiye navendên xizmetguzariyê, stasyonên elektirîkê, gaz û avê û binesaziyê, di encamê de jî ziyanên canî û qurbanî çêbûn." ENKS dibêje, "Ev êrîş bûn sedema rawestandina karûbarên nexweşxaneyan û kirîza sotemeniyê peyda kir, ku ev yek dê êş û azarên xelkê di van şert û mercên dijwar de, du qatan zêde bike, nîgeranî û nearamiyê çêbike û xelkê deverê dê zêdetir koçber bibin." Herwiha ENKSê diyar dike, "Ev êrîş piştî êrîşa xwekujî ya li paytexta Tirkiyê, Enqere tên, ku Partiya Karkerên Kurdistanê berpirsyariya wê girtibû ser xwe, berpirsên Tirkiyê jî ew wek kiryareke terorîstî binav kir û gefa bersivdana wê yekê xwar." Di daxuyaniyê de hat gotin: "ENKS hertim tundûtîjî û hemû kiryarên terorîstî yên ku aloziya rewşê zêde dikin û karesatên zêdetir bi serê sivîlan de tînin, red kiriye." ENKS di beşeke din a daxuyaniyê de dibêje: "ENKS di dema ku armanckirina sivîlan, berjewendî û jêrxana xizmetguzarî û aborî şermezar dike, bang li Tirkiyê jî dike ku van operasyonan rawestîne û herêmê ji karesatên din dûr bixe." ENKS daxwaz ji civaka navdewletî dike ku kar ji bo dîtina çareseriyeke siyasî ji kirîza Sûriyê re, li gor biryara 2254 ya Neteweyên Yekbûyî û biryarên din ên pêwendîdar, bike. Herwiha di daxuyaniya xwe de ENKS red dike ku navçeyên Kurdistana Sûriyê bibin meydana çareserkirina nakokiyên navxweyî di navbera PKK û Tirkiyê de, daxwazê ji PKK dike ku rêzê li taybetmendiya gelê Kurd li Sûriyê bigire, destêwerdanê di karûbarên wan de neke û herêmên Kurdî ji metirsiyan û gurkirina nakokiyan dûr bixe.

> **Pêwîste PKK rêzê li taybetmendiya gelê Kurd li Sûriyê bigire**

> **Divê çareseriya kirîza Sûriyê li gor biryara 2254 be**

## Çalakiyên Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Efrînê




---

**Nûredîn Zaza, xebatkarekî bêhempa** Rûpel—2

**Êrîşên ser deverên kêmkirina şer li Idlib û gundewarê Helebê zêde bûne** Rûpel—3



**Riya xwarî** — Henan Cefer > 03




**Giyasêvk** — Dr. Munîb Ehmad > 04

# Nûredîn Zaza, xebatkarekî bêhempa

Kurdistan

Dr. Nûredîn Zaza serokê yekem partiya Kurd li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê, di sala 1919an de li Paloyê li nêzîkî Diyarbekira Bakurê Kurdistanê ji dayik bûye, û ji ber ku malbata wî di sala 1925an de tevlî şoreşa Şêx Seîd Pîran li Bakurê Kurdistanê bibû, bavê wî Yûsif û birayê wî Dr. Nafiz ji aliyê hikûmeta Tirkiyê ve hatibûn girtin, û piştî ku ew serbest hatibûn berdan, Dr. Nûredîn Zaza ku wê demê temenê wî 7 sal bûn, li gel birayê xwe Dr. Nafiz hatibûn Rojavayê Kurdistanê û li bajarê Qamişlo bicih bibûn. Dr. Nûredîn Zaza xwendina xwe ya destpêkîn heya bekaloriya li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê xwendibû, û di pişt re berê xwe dabû welatê Iraqê û li Bexdadê di sala 1944an de demekê hatibû girtin, piştî serbestberdana wî li Iraqê, wî di sala 1945an de berê xwe dabû welatê Lubnanê û li Beyrûtê xwendina xwe ya bilind di beşê Zanistên Siyasî de li zanîngeha Frensî bidawî kiribû, û di pişt re, Dr. Nûredîn Zaza di sala 1949an de berê xwe dabû welatê Siwîsera, û li wir xwendina xwe ya Diktora di Felsefe û Zanista Civakî de li zanîngeha Lozanê qedandibû, û bawernameya Diktora di sala 1956an de bidest xistibû, herweha di dema xwendina xwe de li Ewropa, Dr. Nûredîn Zaza Komeleya Xwendevanên Kurd li Ewropa di sala 1949an de ava kiribû, û li gel hin hevalên xwe, Kovara Dengê Kurdistan derxistibû. Piştî ku Dr. Nûredîn Zaza vegeriyabû Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê, û li gel mamostayetiya xwe ya li Zanîngeha Şamê di warê Felsefê û perwerdeyê de, wî piştgiriya damezrandina yekem partiya kurd bi navê Partiya Demokrat Kurdistan Sûriya kiribû. Dr. Nûredîn Zaza di tomareke xwe ye dengî de dibêje, ku di dema





Vejandina salvegera koça dawî ya Nûredîn Zaza

damezrandina yekem Partiya Kurd de li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê, hikûmeta Sûriyê ew tuhmetbar dikirin ku ew dixwazin Sûriyê perçe bikin û dewleteke kurdî ava bikin. Dr. Nûredîn Zaza dibêje, ku piştî dadgehkirina wan, hikûmeta Sûriyê têgihişt ku wan tenê partiyeke kurdî ava kirine, û daxwaza wan ne perçekirina welatê Sûriyê ye, û wan tenê dixwest miletê xwe hişyar bikin, û ji bo azadiya Kurdistanê bixebitin.Dr. Nûredîn Zaza di sala 1960î de li gel hin hevalên xwe ji aliyê hikûmeta Komara Erebî ya Hevgirtî ve, ya di navbera Sûriyê û Misrê de hatibûn girtin, û ji ber xebata xwe siyasî ew demekê ji bo parêzgeha Siwêda li Sûriyê hatibû sirgûnkirin.Dr. Nûredîn Zaza di berevaniya xwe de li hember dadwerê Dadgeha Ewlekariya Dewleta Sûriyê gotibû: “divê ku win rastiya hebûna miletê kurd li ser axa xwe li Bakurê Komara Erebî ya Yekbûyî bizanibin, ku ji mêj ve ta niha bi biraderên xwe yên Ereb re dijî, û ew miletekî xwedî ziman û filiklor û dîrokeke taybete, û girêdana wî bi van tiştan de, nebûye cihê jihevçûn û nexweşiyê di navbera kurd û Ereban de”. Di sala 1962an de, Dr. Nûredîn Zaza wekî nûner ji ber partiya xwe ve, tevlî hilbijartinên parlemantoya Sûriyê bibû, lê ji ber nîr û mercên wê dem û qonaxê, ew di hilbijartinên parlemantoya Sûriyê de biser neketibû, û di pişt re di sala 1963an de ew ji partiya xwe dûrketibû, ew jî bibû sedem ku Dr. Nûredîn Zaza di sala 1966an biçe Libnanê û li wir jî demekê hatibû girtin, û di sala 1967an de ji Libnanê û Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê derketibû û berê xwe dabû Turkiyê û Bakurê Kurdistanê, û di pişt re di sala 1970î de careke din çûbû Siwîsera û li wir jiyana xwe berdewam kiribû. Dr. Nûredîn Zaza ne tenê di warê siyasî de bû, wî di warê rewşenbîrî de jî kar dikir û xwedî gelek berhem bû, gelek nivîs û çîrokên wî di Kovara Hawarê ya Mîr Celadet Bedirxan de hatine weşandin, û hin pirtûkên wî jî hatine weşandin, û ji wan jî: Şerê Azadî, Memê Alan, Keskesor pirtûka kurteçîrokan ji aliyê weşanxaneya Nûdemê ve hatibû weşandin, û pirtûkek jî bi navê Bangek ji bo Miletê Kurd di sala 1982an de belav kiribû, û pirtûka Şivanê Kurd ya Erebê Şemo jî wergerandiye, herweha hin nivîsên wî jî hîn nehatine weşandin. Dr. Nûredîn Zaza ji keçeke Siwêserî zewicî bû, û lawekî wî bi navê Şengo heye. Di roja 7ê Cotmeha sala 1988an, Dr. Nûredîn Zaza di temenê xwe yê 69 salî de li welatê Siwîsera jiyana xwe ji dest dabû, û li goristaneke bajarê Lozanê hatibû binax kirin.

# Êrîşên ser deverên kêmkirina şer li Idlib û gundewarê Helebê zêde bûne

Kurdistan

Piştî êrîşa ser kolêja serbazî ya Humsê ku di encam de zêdetirî 100 kes hatin kuştin, rejîma Sûriyê û hêzên Rûsî êrîşên xwe li devera kêmkirina şer li bakurê Sûriyê û taybet li parêzgeha Idlibê zêde kirine, û di encama van êrîşan de hejmareke zêde ya welatiyên sivîl bûne qurbanî. Bergiriya Sivîl ya Sûriyê radighîne di vê dema dawî her yek ji artêşa rejîma Sûriyê û hêzên Rûsiya êrîşên xwe zêde kirine û bi tundî deverên sivîlan dikine armanc, ku ji ber van êrîşan bi sedan welatî bûne qurbanî û hejmareke zêde ya malan wêran bûne, herwiha çend kampên koçberan jî hatine bomebarankirin, û tîmên wan bi lezgînî dighên wan cihên ku têne armanckirin, û gelek caran ji ber bombebarana himbiz tîmên gelek astengiyan dibînin heta ku bighên cihên mebest. Îtîlafa Niştîmaniya Opozîsyona Sûriyê di daxuyaniyekê de ev êrîşên ser deverên Kêmkirina şer şermezar kir û ragihand,  careke din rejîma Esed rêbaza serbazî peyrew dike û êrîşênx we zêde kirine, herwiha welatiyên sivîl li deverên Idlib û Gundewarê Helebê yê Rojava dike armanc ku heta niha bi dehan kes bûne qurbanî, û koçberiyeke navxwe ya zêde de jî rû daye ew jî ji ber armanckirina berdewam ya rejîma Esed ji deverên sivîl re. Îtîlafa Niştîmaniya Opozîsyona Sûriyê hişyariyê ji berdewamiya operasyonên ser sivîlan û operasyonên serbazî û bikaranîna çekên qedexekirî dide û radighîne ev yek dê bi awayekî rasterast gefê li ser jiyana zêdetirî 4 milyon welatiyên sivîl çê dike û dihêle ku pêlên koçberiyê zêdetir bibin û taybet ku niha werzê zivistanê nêzîk bûye, û ew xelk di rewşeke xerab de dijîn. Îtîlafa Niştîmaniya Opozîsyona Sûriyê daxwaz ji Neteweyên Yekgirtî û Civata Asayişa Navdewletî û Civaka Navdewletî dike ku bi awayekî lezgîn destêwerdanê bikin ji bo rawestandina vê Tawana mezin li ser xelkê Idlib û gundewarê Helebê û derbaskirina alîkariyên pêwîst ji bo rûnedana karesateke mezin ya mirovî derheqê welatiyên sivîlan.

**«Pêwîste êrîşên ser Idlib û gundewarê Helebê werin rawestandin»**



# Riya xwarî



Henan Cefer

Roja bêhnvedanê ye, Baran hîn li ser nivînê xilmaşkêfî ye,şehnaz di meha çaran de ducanî ye, şiyar dibe xwe têz dike, li pêş neynikê xwe çê dike pêgera wê li zengil dikevê, Lîloza diyarî firoş e daxwaza serdana wê dike, şehnaz dilxweş dibê û dibêje fermo ez li benda te me, heya demhatina Lîlozê Baran şiyar dibe û şehnaz qehwê datînê ser argûn ...

- Li gulistana hewşê qehwê vedixin û sibeha xwe bi hev re diborînin, şehnaz bi behitandin dibêjê “waw çendî xweşike” hele bala xwe bi vê pinpinîka rengîn din, çawa ji kulîlkê diçe kulîlkê... di wê dîmena şahiyê de ne, çivîk ji darê xwe davêje pinpinîkê û ji nişkê ve pisîk ji ku derhat nizam xwe avêt çivîkê û reviya. Seyr man bi vê bûyarê, tiştê nedihat nîgaşê mirovan, Lîlozê got “mêratê ji ku derhat” wek birûskan xwe avêtê û nîçîr kir. Derfet nehat lîlozê ku bipeyvê bi diyarbûna baran, di ci de rabû xwatir xwast û derket…

- ( Lîloz jinek pirbêje, gerok e, ji xwe hez û xweş e, bejn qelew û li ser xwe ye, gelek li xwe sedikê, xişr û diyariyan difiroşê, zû zû xwe davêje taybetmandiya kesan û dikevê bîrûbaweriya xelkê, xelkê dinasê di riya firotinê re ).

- Piştî çend rojan ji zarokbûndina şehnazê, lîloz diçe serdana wê bi diyarî û pîrozkirina nûbûndina mendal, bi suhbet û denûstandinê re pirsî “baran çi diyarî ji te re diyarî kirî”!! şehnazê tişt nebir ber dilê xwe û bi şêweyekî asayî got ,, ne tişt,,… lîlozê got “ çawa bû ne tişt” hele li vê rûheyva çeleng mêzeke te aniye, te neh mehan xem û êşa ducaniyê hilgirt, gerek diyariyek giranbiha ji te re diyar bikira. Hêdî hêdî derbasî taybetmendiya wê bû û got bilebile di roja rojbûna te de jî nehanî û ne di roja mêrkirinê de jî... heya cejna evînê jî ji te re diyarî nehanî!!

- şehnazê bi serî zimên bi niç bûnê bersiv dayê û got ev gerdîş (adet) li ba me tune ye. Lîlozê berdewam kir eger em li raboriya xwe vegerin wisa bû lê dem û jiyan hatî guhartin, diyarî bi xwe nîşana hezkirinê ye, lê belê pir mêr hene jinan wek amûrek malê dijmêrin yan jî ferfûra li ser masê ye, nizam çima tenê bi şevê hestyar dibin jina xwe ye, Şêrîn e, tu sîmavê nas dike mêrî wê jî endazyar e wek baran her boneyekê gelek diyarî jê re tinê û her demekê tên ba min xişr û diyariyan dikirin û diçin seyranê.

-Ev peyvên tûjkirî ketin cegera şehnazê û bi germa pizotê wê bandor bû, berî ku li gotinên wê vegerê, baran vegerî keleboxa peyvên lîlozê derhat, hêrs bû û bi ser baran de barandin, ketin qirikên hev, agir bi giyanê wan ket, gurr bû, bû pirsgirêk, ji hev dilgiran bûn, bi kêra peyvên tûj hev birîn kirin….

- şêroyê lîlozê rewş û pêwendiya xwe bi mamosteyan re xweşik bû li ser pişta hevalê xwe bi kevirên kişikê dilîst her carê serbazek pêş de dide û li hevalekî xwe dadide, şagirt li dibistanê siza û riswa dibin, tiştê li dibistanê çê dibe diyar dibe dêbav hayî dibin bi riya kê nizanin û çawa dêbav bi wan hayî dibin dîsa nizanin, demê pirs dikin , “kê bi we re vegot” ? bersiva wê pirsê netê dandin, di nav hevalan de bû arîşe , vê riya xwarî hêşt her yek gumanê bibe ser yekî din û hemû ji hev gumandar in…

- Rojekê di riya rastlêhatinê re diyar bû ku şêro hetîk û gendeliyan li hevalên xwe dide.

- Hemî heval li hewşa dibistanê bi goga lingan dilîzin, demê şêro hat yekser gog girtin û çûn li aliyek hewşê li hev kom bûn û şêro qewitandin bi hev re soz û peyman dan kes bi şêro re nepeyvê û li kuçeyê jî şêro dane alîyekî nema têkiliya wî bikin. Şêro têgihîşt bi gendeliya wî hayî bûne, çû ji wan lêborîn xwest. Kesî nepijirand…..

# Efrîn.. Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî piştevaniya projeyên civaka sivîl dike

Kurdistan

Di berdewamiya çalakiyên wê de, Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Efrînê û gundewarên wê dest bi projeyên piştevaniya civaka sivîl kiriye. Li navenda Koma Raperîn ya foloklorî li gundê Basûtê, sê xulên cuda yên rahênanê yên wek karên destî, nîgarkêşî û fêrbûna dîlanan hatine vekirin. Beşdarbûyeke xula fêrkirina karên destî bi navê Hemîda Sîso wiha dibêje"Em gelekî bi vekirina van xulên rahênanê kêfxweş in, em di malê de bêzar bibûn û me nema dizanî çi karî bikin, di vê xulê de me sebra xwe anî û em fêrî pîşeyeke nû bûne, herwiha em fêrî danûstandinê jî bûne, û ev yek jî ji bo pêşketina Basûtê û deverê gelekî baş e. Spasiya Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî dikin ku van çalakiyan ji bo me encam dide."
Di xula nîgarkêşiyê de, beşdarbûyên xulê li ser vê hunerê bi awayekî akadimî li ser destê mamsoteyên pispor têne rahênankirin.
Herwiha di xula fêrbûna dîlanên foloklorî de, zarok li ser şêwaz û çawaniya encamdana dîlanên Kurdî yên foloklorî têne rahênankirin. Raperîn Xelîl, endama Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Efrînê dibêje"Em wek Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Efrînê li gundê Basûtê me piştevaniya Koma Raperîn kiriye û me ji wan re navend amade kiriye û du beşên nû li vê navendê jî hatine zêdekirin, û sê xulên cuda yên karên destî, nîgarkêşî û fêrbûna dîlanan hatine vekirin, heta ku xelkê Basûtê sûdê jê bibînin".




Piştî erdheha 6ê Sibatê û heta niha Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî di kar û çalakiyên xwe di ji bo xelkê Efrînê berdewam e, û heta niha piştevaniya bi dehan projeyan kiriye, herwiha hebûna Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Efrînê hander e ku koçberên Efrînê vegerin ser mal û milkên xwe.


# Dîwana «Hestenest» di demeke nêzîk de belav dibe

Bidûvçûn

Di demeke nêzîk de, Nivîskar Ebdulhekîm Mihemed dîwana xwe ya helbestê ya bi navê "Hestenest" û grûpeke çîrokan ku ji wêjeya Holendî hatine wergerandin belav dike.



Nivîskar Ebdulhekîm Mihemed di daxuyaniyeke taybet de ji ARK re ragihandiye dîwana wî ya nû ji 106 rûpelan û 39 helbestan pêk tê ku ew helbset li ser jiyan, mirin, evînî, mirovatî û welat in, û di demeke nêzîk de dikeve nava destê xwendevanan de.
Nivîskar Ebdulhekîm Mihemed got jî pirtûka wî ya din grûpeke çîrokên zarokan e ku ji wêjeya Holendî hatine wergerandin û niha ji bo çapkirinê amade ye û ew jî di demeke nêzîk de derdikeve.
Ebdulhekîm Mihemed kî ye:
-Jidaykbûyî sala 1977an




li gundê Girê Pirê yê Tirbesipiyê.
-Beşê Zimanê Fransî li zanînega Şamê temam kiriye.
-Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistan-Sûriya ye.
Berhemên wî:
- Ziman û Rêzimana Giştî ya Kurdî - Zaravê Kuremancî
- Koça Dawî -romaneke wergerandî
-Hestenest-dîwan
- Xaltî- lêkolîneke wergerandî
-Hejmareke gotar bi herdu zimanên Kurdî û Erebî ku di rojnameyan de hatine belavkirin.

## Giyasêvk



Dr. Munîb Ehmad

Berdewamî li ser mijara Giya Dermana vê carê em dê li ser Giyakî biaxivîn kû li Beriyê û li Bêndherê dora Gundên me ê Kurdistana Sûrî şîn tê û bineke gelekî xweş didê ew ji Beîbûne . Bi Kurdî:Beîbûn (Giyakê Sêva) Bi latinî:Chamomilla Matricaria Bi Rûssî рамашка Аптечная bi Erebî :بابونج Bi Inglizî : Chamomile Beîbûn Giyakî yeksala neye ta 40cm dirêj dibê di Miha Tirmihê de Kulîlk didê rengê Kulika wê zere hevdû girti ye bihneke gelek xweş jê tê jere dibêjin bina Geyakê Sêva . Ji hêla Ximikî ve kûlîlka Beîbûnê gelek pêkhate hene ji wan Petrolîn Firîne(زيوت طيارة)ev Zeit tê naskirîn bi navê Xamozolîn her weha Faronezin ,Bisabalin kardinin Mersin . Xamozolîn pêkhateya herî giringe . Her weha Flavonoid û Kûmarîn ,Vitamin c,Karotin. Di destpêka kû kûlîlka Giyakê Sêva çê dibê tê çinîn û li ber sîkê tê hişkirîn û wekû Çayê te vexwarin ,Şehiyeta mirov di vekê Tirşiya Midê kêm dikê ,Mikrobê poz û Dev dikûjê ji bo Sermê gelejk başe ,herweha Qolinca hinava kem dikê Beîbûn tevlû Giyayên di dibê û weke Zihûrat tê vexwarin .

